

Planî fêrkarîy hawçerx

Bo

Zaroxane

Komek 2009

Planî fêrkarîy hawçerx bo zaroxane

Rêkxirawî komek

Hewlêr 2009

Tercemekirawe le zimanî norwêjîyewe: Ako Modîrî

Serçawe

Utgitt av:

Kunnskapsdepartementet, april 2006

Heftet kan kjøpes gjennom

Akademika AS

Pb. Blindern, N-0134 OSLO

Telefon: +47 22 18 81 99

Telefax: + 47 22 18 81 01

www.akademika.no

Design: Tank Design as

Trykk: RK Grafisk AS

Opplag: 50 000

F-4205 B

Foto: Sveinung bråthen fastsatt av Kunnskapsdepartementet 1. Mars 2006

Em berheme be elfbêy aramî:

https://www.komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK_PDF/PlaniFeerkari_Zarokhane.pdf

Pêrist

Pêşekî	5
Beşî yekem	6
1- <i>Amancî zaroxane</i>	6
2- <i>Zaroxaney taybet</i>	6
3- <i>Behay bineretîy zaroxane</i>	6
4- <i>Mindal û mindaletî</i>	7
5- <i>Beşdarîy mindal</i>	7
6- <i>Harîkarîy xêzan</i>	8
7- <i>Zaroxane wek dezgeyekî fêrkarî</i>	9
8- <i>Jîngey zaroxane</i>	10
9- <i>Mindal wek tak</i>	10
10- <i>Zaroxane bo mindalanî netewe û dînî ciyawaz</i>	11
Beşî dûhem	12
1. <i>Çawdêrî û perwerde</i>	13
2. <i>Geme</i>	14
3. <i>Fêrbûn</i>	14
4. <i>Twanay civakî</i>	15
5. <i>Twanay zimanizanî</i>	16
6. <i>Zaroxane wek buwarêkî ferhengî</i>	16
Beşî sêhem	18
1. <i>Danûstan, ziman û têkst</i>	18
2. <i>Leş, cûle û saxlemî</i>	19
3. <i>Huner, ferheng û dahênan</i>	20
4. <i>Siruşt, jînge, teknîk</i>	20
5. <i>Akar, dîn û felsefe</i>	21
6. <i>Jîngey dewrûber û civat</i>	22
7. <i>Jimare, şêwe û endaze</i>	22

Beşî çiwarem	24
1. <i>Plan danan</i>	24
2. <i>Dokîwmêntbendî û tomarî zaroxane.....</i>	25
3. <i>Helsengandinî karî zaroxane.....</i>	26
Beşî pêncem	27
1. <i>Xwêndinî bineretî</i>	27
2. <i>Xizmetguzarîy dezgey çawdêrîy mindal</i>	27
3. <i>Binkey saxlemî.....</i>	28
4. <i>Xizmetguzarîy fêrkarîy – derûnnasî.....</i>	28
5. <i>Dezgey fêrkarî</i>	28
6. <i>Hawkarîy dîke.....</i>	29

Pêşekî

Rêkxirawî «komek» em berhemî «planî fêrkarîy hawçerx bo zaroxane» yey le zimanî norwêjîyewe tercemey kurdî kirdûwe, lêrew lewê wirde destkarîy kirdûwe be mebestî guncandinî legel helûmercî Kurdistanda.

Planî fêrkarîy hawçerx bo zaroxane hem nawerok û behay bineretî, hem şêwaz û sinûrî karî zaroxaney diyarî kirdûwe. Lem planî fêrkarîyeda hem qanûnî taybet be zaroxane û hem peymannamey cîhanî, be taybetî peymannamey zarokanî UN salî 1989 reçaw gîrawin.

Planî fêrkarîy zaroxane bo:

- Perlemanî Kurdistanê bibête serçaweyê raman û serinc
- Wezaretî fêrkarî (perwerde û xwêndinî bala) y Kurdistanê bibête serçawey biryarî pêwîst
- Karmendanî zaroxaney, wek amirazêk bo plan danan, dokîwmêtbendî û helsengandin.
- Bo xêzane zanyarî lê werbigirin derbarey çonîyetîy berêwebirdin, derfetî beşdarî û biryardan le zaroxaneda.
- Xawen û berêweberanî zaroxaney planî karî xoyanî lê darêjin.
- Şarewanî û fermangey dîkey hkûmet erikî çawdêryan le estoye.
- Bo mêdyay Kurdistanê karî Leser bikat.

Erikî zaroxane

Zaroxane debê be hawkarî legel xêzanda derfetî geşey dirust bo mindalî jêr temenî xwêndin terxan bikat.

Erikî zaroxane:

- Dabînkirdinî perwerde û çawdêrîyekî guncawe bo mindal le keşêkî fêrkarîy lebarda.
- Şiwênêk bêt hem bo fêrkarîy mindal û hem bo asûdegîy xêzan.
- piştîwanî yekbeyekî mindalan bêt.
- Rêz le mindal bigirêt û berjewendî civatîş reçaw bigirêt.
- Zemîney geşe bo mindalî jêr temenî xwêndin desteber bikat.
- Handerêk bêt bo barhênanî kesayetîyek amadey berengarbûnewey hereşey fizîkî û derûnî hebêt.
- Mindal fêrî beşdarî bikat le civatda.
- Pêdawîstîy fizîkî, civakî, ferhengî û hunerî bo mindal desteber bikat.
- Twana û astî mindal reçaw bigirêt.
- Parastinî saxlemîy mindal.
- Kar bo yeksanîy zayend.

Civatî Kurdistan pêkhatyekî têkele le ferheng, netewe, dîn û rêçkey dînî ciyawaz. Ew têkelîye civakîye debê le zaroxaneyîş reng bidatewe. Hokarekanî abûrî, civakî, zayend, dînî û ziman le nêw civatda wa dekat mindal be ezimûnî ciyawazewe bête naw zaroxane. Zaroxane piştîwanî hemû mindalêk dekat bê ciyawazîy kesayetî û ferhengî.

Beşî yekem

Amancî serekîy zaroxane

1- Amancî zaroxane

- Amancî zaroxane rexsandinî derfetî çalakîye bo mindalî jêr temenî xwêndin. Em kare debê le nêzîkewe be têgeyîştin û hawkarîy xêzan cêbecê bikirêt.
- Berêwebirdinî zaroxane debê pêbend bêt be carnamey mafî mirovî neteweyekgirtûwekan.

Peymannamey cîhanî cexit lewe deken xêzan berpirsî yekemî perwerde û barhênanî mindale. Biryarî nêwîneteweyî rêgirin le çewsandinewey dînî û ferhengî. Destûrî Kurdistanîş debê herweha bêt. Mindal nabêt le zaroxaneda be zor arastey dînêkî taybet yan dij be dînêkî taybet bikirêt. Zaroxane debê hestyar bêt û nehêlêt mindal bikewête naw kêşey ciyawazîy cîhanbînîy mal û zaroxanewe.

2- Zaroxaney taybet

Yasay zaroxane rêge dedat be damezirandinî zaroxaney taybet û zaroxaney dînî. Zaroxaney taybet debê wek hemû zaroxaneyekî dîke peyrewî destûrî welat bêt. Lew çêweyeda boy heye taybetmendîy xoy biparêzêt be pêy biryarnamey diyarîkiraw. Hemû zaroxaneyek, hkûmetî, taybetî û dînî, debê pêbendî planî fêrkarîy zaroxane û hemû qanûn û rêsa, ferman û biryarêkî zaroxaney giştî bibin.

3- Behay bineretîy zaroxane

Debê berêwberî, perwerde û fêrkarî le zaroxanekanda bibine handerêk bo yeksanîy zayend, azadîy bîr, lêburdin, lêk geşîştin, saxlemî û pêşkewtinî berdewam.

Zaroxane debê girîngî bidat be behay bineretîy wek, pêkewe guncan, çawdêrî, berpirsayetî, rêz bo mirovayetî û mafî ciyawazbûn, yeksanîy mirov, beraberîy zayend, azadîy tak û lêburdin.

Yeksanîy nêwan zayendî nêr û mê debê le perwerdey zaroxaneda reng bidatewe. Zaroxane debê mindal perwerde bikat bo dirustkirdinî civatêkî yeksan.

Zaroxane debê karekanî be pêy prînsîpî yeksanîy nêwan herdû zayendî nêr û mê dabinêt. Kur û kiç debê heman derfetyan pê bidirêt, berbîn û berbîst bin (berbîn: bibînîrêt, berbîst: lêy bibîstirêt) û han bidirên bo beşdarîy le hemû çalakîyekî girupkarîy zaroxane. Debê karmendan boçûnî xoyan be kiçan û kuran pêşan biden û pêyan biselmênin ke civat çawerwanyane.

Zor girînge mindal her le zaroxanewe fêrî berpirsayetî bikirêt beranber: jînge, ferheng, jiyânî mirov û saxlemî. Debî têgeyîştin le pêşkewtinî jiyânî rojane û rêzgirtin le jiyânî bernamey serekî bêt.

Debê xoşewîstî û yekgirtin berdî binaxebin le ferhengî êmeda. Lêburdin û rêz debê bikirêne behay binemay zaroxane. Zor girînge mindalan le zaroxaneda hest be xoşewîstî û serincî gewre biken. Fêrî girupkarî û hawkarî bikirên. Xo xistine cêy kesî beranber wa dekarat mirov pitir bîr le yarmetî û lêburdin bikatewe. Le riwangey cîhanîyewe girînge xoşewîstîy jiyân û hawkarîkirdin lay mindal geşe bikat. Zaroxane debê binaxey pitew dabinêt bo:

- Fêrbûnî berdewam be dirêjayî temen.
- Beşdarîyekî dêmokrataney çalak le civatda.
- Hawkarî û lêk têgeyîştin leger xêzan û dewrûber.

Katêk zaroxane mindal rêniwên dekarat debê temen, paşxanî ferhengîy mindal, dîn û peywendîy civakîy mindal reşaw bigirêt. Zor girînge kar bikirêt bo têgeyîştinêkî heme layene derbarey rûdawî nêw zaroxane. Debê rêz le serbestîy tak, takî mindal û xêzan bigirêt.

Karmendî zaroxane debê nimûney piyadekirdinî behay bineretî bêt. Rengdanewey kar û rûdaw debê le danîştinî fermî pêdagogîda bixirêne ber bas. Zaroxane debê be şeweyekî sistematîk bixirêne ber helsegandin û dîvçûn.

4- Mindal û mindaletî

Serşar û serçawey planî fêrkarîy xizmet û barhênanî mindale. Herdû layenî fîzîkî û hizirîy mindal le proseyekî hawaheng û jîngeyekî hemwarda geşey pê dedirê.

Yek le taybetmendîyekanî serdemî mindalî hawkarîye le gemedâ. Lewêda destpêşxerî, fantazyâ û beşdarbûn cêy xoy dekaratewe. Mindal serinc dedat, pirsiyar dekarat, degerêt bedûway çêj û ezimûn le meydanî fêrbûnda. Çawdêrî, perwerde, geme û fêrbûn le serdemî mindalîda şewazekanî riwange le mindalda, birwa bexobûn û be kesanî dîke û arezûy fêrbûn le dahatûda lay mindal dirust dekarat.

Pêkewebûn, geme û çalakîy rêkûpêk mindal aşna dekarat be cîhanî fîzîkî û civatî dewrûber. Ferhengî kon zîndû dekenewe û ferhengî niwê dadehênin. Zaroxane debê, keşêkî fêrkarî dewlemend, corawcor û handerane le jîngey fêrbûn bo mindalan desteber bikat, be reşawgirtinî temen, zayend, xawen pêdawîstîy taybet, civat û paşxanî ferhengî. Debê çawdêrî û çalakîy zaroxane leger tak û girupî corawcor biguncênrêt.

Mindal be hoy çalakî û taybetmendîy xoy karîgerî le ser dewrûberî xoy dadenêt, çêj wergirtin le bînîni kesanî dîke karîgerî dadenêt le ser têgeyîştinî xudî mindal. Karmendan debê be rêz, birwa, dilnyayî û yektir selmandin leger mindalda reftar biken. Çonîyetî bînîni mindal û mindaletî karîgerî debê le şewazî têgeyîştinî karmendan le mindal û hawkarîkirdinyan. Têgeyîştin le şewazekanî derbirîni mindal zor girînge.

Mindal heye jiyanyan sext û griftdare, zaroxane berpirse zemîney çaresazyân bo birexsênêt. Wekû hawkarî leger fermangey peywendîdar û kesanî pispor.

5- Beşdarîy mindal

Mindal le zaroxaneda mafî xoyetî boçûnî xoy Leser çonîyetî berêwebirdinî zaroxaneke derbirêt. Mindal debê rêgey pê bidirêt çalakane beşdarî le şirove û planrêjîy karekanî zaroxaneda bikat. Bepêy temen ra û serincî mindal karîgerîy xoy debê.

Zaroname (carnamey mindalan) y neteweyekgirtwekan UN girîngî dedat be mafî derbirînî mindal le dunyay xoyan û behend wergirtinî boçûnekanyan. Mindal mafî ra derbirînî heye, karîgerî hebê Leser dewrûberî xoy. Nore (rol) y mindal û corî beşdarbûnî le prose y biryarda peyweste be temen û astî bîrkirdinewey ew mindalewe. Mindal debê hest bikat beşêke le civat û rabiênrêt serbexo biryar bidat û bitwanêt twanakanî xoy derbirêt. Mindal debê fêr bikirêt xoy le cê û doxî kesanî dîke dabinêt heta bitwanêt pey be beranber bibat.

Zimanî ceste (cûley leş) û zimanî axaftin her dûkiyan amaje deden be çonîyetîy doxî mindal. Mindalanî zor biçuk boçûnî xoyan pitir le rêgey zimanî cestewe derdebirin. Debê hemû hest derbirînêkî mindal behend werbigirîn. Mindal ger pirsyarî hebû, hanî bide û çalakane piştîwanî lê bike boçûnî xoy derbibirêt. Katêk mindal deşikênrête we towî rik û kîne, azardan û bêsozî le naxîda deçênrên.

Zaroxane debê girîngîy taybet bidat be şêwey derbirînî mindal. Karmendan debê giwê le mindal bigirin û twanayan hebêt zimanî cestey mindal têbigen. Her ew derbirîneye wirde wirde berew derbirînî wişe û axaftin derwat.

Zaroxane debê, bê ciyawazîy, rêz le xwast û ezimûnî mindal bigirêt û taybetmendîy hemûwan reçaw bigirêt. Debê mafî derbirîn bidirêt be mindal û karîgerîyan bixirête çêwey bername û birgey karî zaroxanewe. Behend wergirtinî mindal û xwastekanî keşêkî başî peywendî le nêwan mindal û karmendan û herweha le nêwan karmendan û xêzanda dirust dekat.

Beşdarîy mindal le karûbarî zaroxaneda pêwîstî be kat û şiwên heye bo giftûgo legelyanda. Planî karî zaroxane debê be şêweyek bête dariştin û rêk xistin bitwanêt şiwên û kat bidat be xwast û beşdarbûnî mindal. Bem şêweye dekirêt mindal han bidirêt bo serxistinî jiyani rojaney xoy le zaroxaneda. Mindal debê ezimûn werbigirêt lew gewraney be wirdî û berpirsane girîngî be hemû takêkî girupeke deden.

6- Harîkarîy xêzan

- Zaroxane debê geşe û çalakî bo mindalanî jêr temenî xwêndin dabîn bikat û le nêzikewe hawkarî legel xêzanî mindal bikat.
- Zaroxane debê le çawdêrî û perwerdeda yarmetî xêzan bidat, bem şêweye binaxeyekî pitew dirust debê bo geşe, bo fêrbûnî berdewam û bo beşdarîy çalakaney mindal le civatêkî dêmokratda.
- Bo dilnyabûn le harîkarî legel xêzanî mindal, debê hemû zaroxaneyek encumenêkî rawêjkarî xêzan û desteyekî helbijêdirawî hawkarî hebêt.

Lêreda mebest le mal û xêzan hem xêzan û hem kesanî dîkey serperîştyar û berpirsî mindal degirêtewe.

Le piley yekemda xêzan berpirsayetîy perwedey mindalî le estoye. Em xale le qanûnî mafparêzî mindalanda debê biçespê. Zaroxane, paş malewe, tewawkerî jîngey mindale. Zaroxane debê rêz le rêsa ciyawazekanî xêzan bigirêt.

Her dû çemikî têgeyîştin û hawkarîy naw qanûnî mindalan rûberî ciyawaz le peywendî nêwan xêzan û zaroxane degirête xo. rêzî dû layene û selmandinî yektir mercî girîngin. Hawkarî wate berdeyam gorînewey zanyarîye derbarey mindal. Debê pirsiyarekan derbarey asûdegî û geşey mindal legel şêwazî perwerde û berêwebirdinî zaroxanekeda giftûgo bikirêt. Harîkarî debê derfet birexsênêt bo têgeyîştinêkî dû layene lew griftaney ser heldeden bo nimûne katêk mindalêk pêwîstî be agadarîyekî taybete.

Karmend debê kar biken bo dozînewey hawsengîy nêwan rêz le boçûnekanî xêzan û behend wergirtinî mafî mindal le layek û behagelî bineretîy zaroxane le layek.

Xêzan û karmendanî zaroxane berpirsin le xoşguzeranî û geşey mindal. Harîkarîy rojaney nêwan mal û zaroxane debê Leser binaxey kiraweyî û mitmaney dû layene bêt. Xêzan debê bûwêrane basî ew babetane biken ke peywestî doxî mindaleken, tenanet ger basekeş kêşedar bêt. Xêzan debê bizanêt ke karmendanî zaroxane be pê qanûn razgirin, nihênîparêzin, basî taybet be mindal û xêzanî mindal deparêzin û lay kes naydirkênin. Hem karmendanî zaroxane û hem xêzan debê le bîryan bêt zaroxane niwênerayetî civat û behay bineretîy civate, berêwebirdinîşî erikî karmendanî zaroxaneyê.

Karmendanî zaroxane berpirsin le pêdanî zanyarîy pêwîst be xêzan derbarey çonîyetî berêwebirdinî zaroxane û beşdarîy xêzan lem proseveda. Xêzan debê dilnya bikirênewe lewey mindalekanyan rêzyan lê degirêt û beşdarin le proseyekî fêrkarîy giştîda.

Zaroxane debê giwê ragirêt bo pêşniyaz û xwastî xêzan hem wek tak û hem be girup. Şêwey berêwebirdinî zaroxane debê berdeyam le layen encûmenî xêzan û destey rêber hawkarî giftûgo bikirêt. Zor girînge lem buwareda bayex bidirêt be lêk geşeyîştin û dilnyayî nêwan zaroxane û mal.

Zaroxane wek şiwênî çawpêkewtinî mindal, xêzanî mindal û gorînewey zanyarî ferhengî, erikêkî girîngî le estoye. Eriki zaroxaneyê le kobûnewekanda zanyarî tewaw bidat be girupî ferhengî û dînîy ciyawaz û agadaryan bikatewe le çonîyetî berêwebirdinî zaroxaneyê. xêzanî xawen ferhengî ciyawaz pêwîstî be rêzgirtin, giwêgirtin û têgeyîştine. Karmendî zaroxane bo em mebeste debê birway be xoy hebêt, nexşî le karda rûn û diyar bêt.

Xêzan hen pêwîstyan be yarmetî û rêniwênîye derbarey çonîyetî perwerdekirdinî mindal. Car heye xêzan kêşey astengî nawxoy heye û pêwîstî be hawkarîy pispore heye. Debê zanyarî bidirêt be xêzan derbarey dezgey yarîderî pispore.

Xêzan le rêy beşdarbûnyan le encûmenî rawêjkarîy xêzanda karîgerîyan debê Leser rewî kar û çonîyetîy berêwebirdinî zaroxaneyê mindalekanyan.

7- Zaroxane wek dezgeyekî fêrkarî

Zaroxaney baş herdem peroşî geşey karmendan û serxistinî astî twanayane.

Zaroxane wek cêgeyek bo geşekirdin û fêrbûn rolêkî girîngî heye bo mindalî jêr temenî xwêndin. Zaroxane debê bepêy pêwîst kar bo geşey mindal bikat. Be reçawgirtinî layenî fîzîkî, civakî, nîştecebûn, ferheng û paşxanî dînî û neteweyî derfetî yeksan birexsênêt bo geşeyekî dirust.

Zaroxane wek dezgeyekî perwerde taybetmendî û dabunerîti xoy heye w debê bayexî pê bidirêt. Leweş bitirazê zaroxane fêrgeye û debê wek fêrge çawî lê bikirêt. perwerde û bar hênan, game, çalakîy rojane û fêrbûn pêkewe beşêkin le taybetmendîy zaroxane. Zaroxane dahênerî ferhenge û rolêkî girîngîşî heye le pitewkirdinî peywendîy nêwan ferhengî ciyawaz.

Zaroxane debê rolî serekîy fêrkarî bigêrêt. Berêweberan û berpirsanî fêrkarî betaybetî berpirsin le dananî plan û cêbecêkirdinî, hêlengandin û geşe pêdanî nawerokî erikekanî zaroxane. Ewan be heman şêwe berpirsin le rêniwênîy karmendanî dîke be corêk ke hemûyan be şêweyekî giştî le kar û erikî xoyan têbigen. Karî berêweberanî zaroxane rexsandinî derfetî gunçawe bo karmendan twanay xoyan piyade biken.

Zaroxane wek dezgeyekî perwerdekarî civakî debê herdem le goran û geşeda bêt. Wek organêkî fêrkarî pêşîrew, debê amadey berengarbûnêwe û xwastî niwê bêt.

8- Jîngey zaroxane

Zaroxane debê jîngeyekî asûde û rengîn bo mindalan birexsênêt, têyda bedem gemanewe hem fêr bin û hem çêj le jîyan werbigirin.

Zaroxane debê jîngeyek bêt gunçaw û xawen kerestey tewawî game û çalakî corawcor bo ewey mindal cûle û ezimûnî ziyad bikat. Derfetî hest û zanînî firewan bêt. Goran le nêwan fêrbûn, game û hoşguşîn nimûney bineretîye bo saxlemîy herdû layenî hizirî û leşekî. Dirustkirdinî jîngeyekî fizîkî çalak le nawewe û derewey zaroxane girîngîyekî zorî heye le çêwey mercekanî planî fêrkarîy zaroxaneda bo şadî û çêj wergirtinî mindal le fêrbûn. Zaroxane debê sinûrî fizîkî mindal (sinûrî ceste) wek beşêkî tewawker le jîngey fêrbûnî mindal reçaw bigirêt. Siruşt û jîngey dewrûberîş derfet dedat bo çêj wergirtin û handan.

Keşî fizîkîy zaroxane debê wa darêjrêt hemû mindalan bitwanin beşdarîy çalakane le game û çalakîyekanda biken. Le dirustkirdinî jîngey fizîkîda debê layene ciyawazekanî mindal wek temen û piley zîrekîyan reçaw bigîrêt.. Mindalan le temenî mindalîda zor pêwîstyan be pişûdan heye hem le derewe û hem le nawewey zaroxaneda bo arambûnêwe û kokirdinewey hest û hoşî xoyan.

Le dirustkirdinî em jîngeyeda debê agadarbîn lewey pêwîstiman be cêge û kereste heye bo girupkarî û çalakîy hawkatî corawcor.

Le planda bo dirustkirdinî zaroxaney mindalan debê helûmercî kesanî xawen pêdawîstîy taybet reçaw bigîrêt. Diyarîkirdinî şiwên û corî bînasazîy zaroxane debê leser şêwazî niwêy cîhanî bêt.

9- Mindal wek tak

Zaroxane debê temen, pêdawîstîy taybet, zayend, paşxanî civakî, netewe, ziman û ferhengî her mindalêk reçaw bigirêt.

Mindal le jêr temenî xwêndinewey girupêkî wêkiçû nîn, pêwîstîyan beranber zaroxane yekcor niye. Pêşkeşkirdinî xizmetî yeksan pêwîstî be guncandinî kare legel taybetmendîy hemû tak û deverêk. Nawerokî planî zaroxane debê be şêweyek bêt mindal hem be tak hem be girup çêjî lê werbigirin. Jîngey bar hênan û fêrkarîy zaroxane debê mindal şad bikat. Zaroxane debê piştgîrî le hemû takêkî

mindal bikat, hewil bidat, be reçawgirtinê helûmercî her yekeyan, jiyaneîkî pir wata legel mindal û gewrekanî dewrûberyan pêk bihênêt.

Karmendan berpîrsin le hemû mindalan, wêray mindalî xawen pêdawîstîy taybet, zayend, temen û paşxan debê hemûyan hest be hawsengîy xoyan biken. Jîngey zaroxane debê corêk bêt hemû tak û ferhengêkî ciyawaz beyek bigen û rêz le yek bigirin wêray ciyawazyan. Rûnkirdinewey ciyawazî û herweha normî hawbeş binaxeyek ferahem dekat bo leyek geştiştin. Aşnabûn be ferhengî ciyawaz lewey xot, derfet derexsênêt bo geşey ayetî û bo kunçkaw (pîrsin - fizul) y derbarey mirov û ferheng û jînge.

Nawerokî bernamey zaroxane debê be corêk bêt cê bo mindalî ciyawaz bikatewe be şewey ciyawaz, be pêy arezû, twana û piley geşeyan têda beşdar bin. Zaroxane berpîrsayetîy taybetî le estoye bo pêşgirtin le astengî û derikkirdinî mindalî xawen pêdawîstîy taybet.

Lewaneye pêwîst bikat beşêkî taybetî perwerdekar bo em mindalane saz bikirêt. Guncandin lewaneye hem layenî civakî û perwerde, hem doxî fîzîkî bigirêtewe. Xêzan û ew layene peywendîdaraney piştgîrî mindalanî xawen pêdawîstîy taybet deken girîngn bo hawkarîkirdinî zaroxane.

Jiyani rojaney zaroxane birîtîye le giwêgirtin, rahêzan û handanî mindal le layen karmendanewe. Zaroxane debê dahênerane kar bikat bo pêşgirtin le plar, le retkirdinewey beranber û le serxistine ser. Karmendan debê karîgerîyan hebêt leser kesayetîy her mindalêk û serxistinî astî birwa bexobûn le keşêkî hêwr û aramda be pêy qanûn û rêskanî civat.

10- Zaroxane bo mindalanî netewe û dîni ciyawaz

Zaroxane debê temenî mindal, xawen pêdawîstîy taybet, zayend, civakî, netewe û paşxanî ferhengî her mindalêk be ziman û ferhengewe reçaw bigirêt

Kurdistan welatêkî fire ferheng, dîn û neteweye û zaroxaney Kurdistanîş debê cêy bo hemwan hebêt. Bepêy rêkewtinnamey cîhanî, mindalanî hemû bine û rîşalêk pêwîstyan be firewandinî ferheng û zimanî xoyane.

Zaroxaney netewe û dîni ciyawaz debê beşêk bêt le civatî xoyan û taybetmendîy ew girupane reçaw bikat. Eriki zaroxaney kesayetîy hemû mindalêk behêz bikat, binema û xesletî ferhengîy netewe û dîni ciyawaz beşêkî here girîngî em buwareye û debê zaroxane bîçespênêt.

Mindalanî ser be girupî neteweyî û dîni ciyawaz tenanet le derewey civat û deverî xoyan mafyan heye be rêzewe helsûkewtyan legel bikirêt û derfetyan bo birexsêt le zaroxaneda şarezay ferhengî xoyan bin.

Beşî dûhem

Nawerokî planî fêrkarîy zaroxane

Nawerokî bernamey zaroxane debê hemelayene û firereng bêt bo ewey hemû mindalêk çêj û ezimûnî lê werbigirêt û bibête yarîderî geşey twanayan. Nawerokî bernamey zaroxane, le rêgey têkelawî û beşdarbûnewe kar bo rahêzanî ziman û twanay civakî dekat.

Debê derfet hebêt mindal çêj le amêrî dîcîtal wergirêt û bîkate serçaweyek bo game û kokirdinewey zanyarî û peydakirdinî zanist û huner.

Nawerokî plan û şêwazî karî zaroxane arastey rûne. Kunçkaw (pirsinî / fzul) y û arezûy mindal tîj dekatewe û hanî dedat berew serincgirtin, wirdbûnewe û fêrbûn, berew dahênan û afirandin. Karmendan debê serinc bidene ew mindalaney xulyay zanînyan germe.

Mindal debê azad bêt le helbijardinî çalakîda û hunerî zaroxane lewedaye xulya û arezûy mindal legel planî karî xoyda rêk bixat, ew dû layene teraz bikat.

Zaroxane debê çawdêrî, perwerde, game, fêrbûn, twanay civakî û ziman pêkewe girê bidat. Zaroxane meydanêkî ferhengîye bo ewey mindal beşdar bêt le dahênanî ferhengîy xoyda. Hemû em xalane le nawerokî bernamey fêrkarîy zaroxaneda têkbestirawin.

Be mebestî asankarî, beşî wane le planî zaroxaneda kirawinete heft wane, her yekeyan derfetêke bo beşdarbûn, peydozî û fêrbûn. Be giştî wanekan seretan bo wanekanî fêrgey bineretî. Le zaroxaneda zemîneyan bo xoş dekirêt.

Çawdêrî, game û fêrbûn

Erikî zaroxaneyê kar bikat bo rahêzanî birway mindal be xoy û be kesanî dewrûberî xoy. Çalakî û beşdarbûnî mindal zanyarîy dedatê derbarey xoy û peywendî legel kesanî dîkeda. Mindal be aşnabûn legel diyardey ciyawaz, birway be kesayetîy xoy pitewtir debê. Rêzgirtin le ciyawazbûn beşêke le beha bineretyekanî zaroxane.

Wirdbûnewey mindal le serkirde, le boçûn û gutaryan, le reftarî corawcoryan debête binema û seretay hizirêkî rexnegirane, le xoy û le dewrûber. Xatirgirtin û hawkarî, saziş û hawahengî le prosey game û fêrbûnda karîgerî heye leser kesayetîy mindal. Behend wergirtinî pirsîyar û serincî mindal rêge xoş debêt bo beşdarbûnî mindal le karûbarî civakîda. Mindal pêwîstî be rêniwênî û yarmetîye bo ewey çalakane be gutar û reftar beşdar bêt.

Fêrbûn û beşdarbûn dû kirdarî tewawkerî yektirin. Be fêrbûn û beşdarî, pêgey mindal le prosey fêrbûn û bar hênanda pitewtir debêt. Derik û rêzyan bo diyardey ciyawaz, bo selmandinî beranber û hawahengî geştir dekat.

Hemû mindalêk mafî heye be giwêrey bûnî xoy reftarî legel bikirêt. Karmend debê bo mindalî rûn bikatewe ke kirdewey mindaleke karîgerî heye leser kesanî dewrûber, leber ewey debê wiryay gutar û reftarî xoy bêt. Merc nîye hemû kirdarêk pesend bêt.

1. Çawdêrî û perwerde

Çawdêrî, perwerde û fêrkarî le zaroxaneda kar deken bo rahêzanî behay mirovdostane, bo yeksanî û rêzgirtin, bo azadîy bîrûra, singfirewanî, xoragirî, saxlemî û geşey berdewamî cêgîr.

Mindal mafî çawdêrîkirdinî heye û debê be peroşewe helsûkewtî legel bikirêt. Karmendî zaroxane wek pîşe erike leserî be peroşewe reftar legel hemû mindalekanî zaroxane bikat. Erikî çawdêrî dawa le karmendî zaroxane dekat serinc bidate taybetmendîy yekbeyekî mindalan û leweş bitirazêt agadarî hemû wirdekarîyekî paşxanî ferhengîyan bin.

Çawdêrîy dilsozane peyweste be giwêpêdan, nêzîkî, xo le cê danan, twana û amadeyî bo hawahengî. Çawdêrî debê hemû doxekanî jîyanî rojane bigirêtewe. Debê reng bidatewe le geman, pak û xawênî, nan xwardin û cil gorînda. Çawdêrî xoy le xoyda behaye û girêdirawe be perwerdewe.

Saxlemîy û aramî mercî girîngin bo fêrbûn û geşey mindal. Cêge û çalakîy handeraney corawcor beşêkin le çawdêrî. Zaroxane debê jîngeyekî pir le şadî, wireberzî, birwabexobûn, dahênan û hawsozî giştgîr pêk bihênêt. Çawdêrîy baş pêşmerce bo rahêzanî kesayetî û hestî berpirsayetîy mindal, bo geşekirdinî twanay civakîyan û bo firewandinî beşdarîyan.

Çawdêrî le zaroxaneda birîtîye le peywendî nêwan karmendan û mindalan û herweha mindalan le nêw xoyanda. Mindal derfetî hebêt çawdêrî mindalî dîke bikat, twanay civakî geşe dekat, derikî bo berpirsayetî û beşdarbûn pitewtir debê.

Perwerde proseyeke kesanî gewresal têyda rêberayetî û rêniwênîy newey ayende deken. Ferheng, behay bineretî, rêsa û reftar le rêy corawcorî fêrkarîyewe degiwêzirênewe bo mindalan.

Karmend debê rêniwênîy mindal biken çon wîst û xulyay xoyan legel rêsa û rêwresimî civatda biguncênin. Mindal debê yarmetî bidirêt bo ewey têbigat pêkewebûn û helkirdin legel kesanî dîkeda çone.

Fêrbûn debê be têgeyîştin û harîkarî nêzîk bêt legel xêzanî mindal. Erikî karmendî zaroxaneyê xalî girîngî peywest be perwerdeî mindalewe legel xêzanda şirove û destînîşan biken.

Jîyanî zaroxane pêkhatyekî alozî mirovayetîye û çawdêrîy birîtîye le hawkarîy dû layene. Mindal debê be şeweyekî dilsozane çawdêrî bikirêt. Emeş pêwîstî be karmendî dilsoz û berpirse le nêzîkewe hoşiyarî geşe û şadî hemû takêkî mindal bêt.

Karmendan berpirsayetîyekî taybetyan le estoye beranber ew mindalaney barûdoxî maleweyan grîftdare û serperîştîyan le xêzanda lawaze. Debê karî taybet bikirêt bo ewey emanîş çêj le jîngey aramî zaroxane werbigirin û hest be asûdeyî biken. Zaroxane û dezgey çawdêrîy mindal debê hawkarîy ew mindalane biken û jîngeyekî başyan bo birexsênin.

Fêrkirdin debê beha binemayîyekanî zaroxane reçaw bigirêt û derfet xoş bikat bo beşdarîy çalakaney mindal le nêw civatêkî dêmokratda. Mindal debê fêr bêt hem xoy biguncênêt û hem azadane bîrî xoy derbibirêt.

2. Geme

Erikî zaroxaneyê derfet birexsênêt bo geman, şadimanî û çalakîy sûdbexş le jîngeyekî aram û geşda.

Geme (wazî, yarî) le jiyani zaroxaneda debê cêy taybetî bo terxan bikirêt. Geme diyardeyekî mirovayetiye, pêgey taybet be xoy heye û beşêkî girînge le ferhengî mindal. Mindal le gemanda fêrî beşdarî, hawkarî, xorastandin debêt û twanay xoy der dexat.

Mindal, wêray ciyawazîy temen, ferheng û ziman, le gemanda fêrî derikkirdinî yektir, selmandinî yektir û hawrêyetî debîn. Gemey bekomel binemayeke bo damezirandinî hawrêyetî le nêwan mindalekanda. beşdarîkirdin le geme û dozînewey hawrê binemay asûdeyî û xo guncandinî mindale le zaroxaneda.

Geme û berhemî hevaletî twanay civakî mindal ser dexten. Be pêçewaney zebiruzeng û bekar hênanî hêz ke debine berbest û rê le geşey civakî û pêkhatinî dostayeti û peywendîy dirust degirin.

Geme mindal fêrî dekat geşe be twanakanî xoy bidat, cîhanbînîy xoy firewin bikat, dîd û boçûnî kesani dîke werbigirêt, derikiyan bikat, hest û bîrî xoy ko bikatewe û darêjêt. Fêrî debê le rêy tojînewe, rawêj û peydozîyewe zanyarî derbarey cîhan û diyardey hemecor peyda bikat. Gemey fîzîkî le der û nawewey zaroxane rê xoş dekat mindal ezimûnî niwê werbigirêt, lêyan wird bibêtewe û karyan Leser bikat.

Geme beşêke le ferhengî mindal û karîgerî heye Leser geşey xoy û dewrûberîş. Le rêgey gemewe ferheng û dabunerêtî gewrekan degiwêzirêtewe bo mindalî biçûk. Geman, çalakî, ciwannasî, nuktebazî û dahênan diyardey hawbuwar û hawkarin. Gemey mindalî biçûk zor peyweste be wirey taybet be xoyewe. Lay mindalî biçûk wire peyweste be derbirînî leşewe le gemanda. Le hawhengîy nêwan mindalanda, em wire û derbirînî leşe geşe dekat. Mindal kuçkawî xoy, twana û dîdgey xoy dekate serşarî geme.

Geme û çalakîy derewe beşêkî girîngin le ferhengî gemey mindalî û debê pereyan pê bidirêt, helbete debê dakewtey ciyografi û barûdoxî keş û hewa reşaw bigîrên. Mindal be gemanî nêw jîngey derewe bîroke û zanyarî niwê werdegirêt. Zaroxane debê derfet bo gemey hemecor saz bikat.

Nawerokî bernamey zaroxane debê zemînesaz bêt bo firewandinî xeyalbazî (fantazyay) twanay afirandin. Karmendan debê le nêzikewe yarmetî û hanî mindalan biden le gemanda. Zemîneyan bo xoş biken sûd le gemey xoyan werbigirin û pêy şad bin. Mindal le gemanda fêrî hawkarî û beşdarî debê. Ew mindaley beşdarîy geme nakat lew hunere civakîyane kembeş debê.

3. Fêrbûn

Zaroxane debê zanyarî bineretî girîng û niwê le buware serekîyekanda bidate mindal. Zaroxane debê yarmetî kuçkawî, dahênan û twanay mindal bidat berew peydozî û piyadekirdinî huner û twana û rastandinî xulyay xoyan.

Zaroxane debê yarmetî kuçkawî, xulyay zanîn û arezûy fêrbûn bidat. Debê hawkar bêt le dananî binemayekî baş bo arezûy fêrbûn legel dirêjayî temenda. Fêrbûn legel dirêjayî temen dekatewe fêrbûnî berdewamî bêbiranewe le hemû serkarêkî jiyanda. Fêrbûn peyweste be helsûkewt legel mirov û jîngey dewrûberda û girêdirawe be geme, perwerde û çawdêryewe.

Mindal le hemû beserhat û rûdawekanî jiyanda zanist werdegirin. Debê wirdbûnê û serincî mindal be hend bigirîn û bekaryan bihênîn bo geşey çalakî û jîngey fêrbûn. Le zaroxaneda xulya û pirsiyarî mindal debine beşêk le prose û babetekanî fêrbûn. Zimanî ceste, zimanî axaftin, hest û peywendîy civakîy mindal debine cêy serinc û têbînî karmendan û le prosey fêrkarîda debine babet.

Xo nasîn û beranber nasîn, helsûkewt legel xelk û jînge, nexşyan le geşey mindalda heye. Zaroxane debê layenî fêrkarîy fermî û nafermîy mindal behêz bikat. Layene fermîyekey planî bo darêjrawe û karmendan berêwey deben. Layenî nafermî be giştî peyweste be helkewtî rojane û twanay mamostawe û geme buwarêkî başî em baseye. Dirust nîye sinûr le nêwan şêwazî fêrbûnî fermî û nafermîda bikêşîn. Herdûk hawmebestin û debê hawaheng bin. Hemû waneyekî fêrkarî debê girê bidirê be herdû doxî fêrbûnê hem fermî û hem nafermî.

Debê karmendan le zaroxaneda peywendîyekî çalkaneyan be prosey fêrbûnî mindalewe hebêt. Mindal heye berdewam le xulyay fêrbûndan. Xerîkî peydozî û tojînewen. Bedûway berengarîda degerên lêy serkewin, pirsiyar le karmend û le dewrûber deken. Mindal heye kemtir peroşî zanîn û peydozîye.

Karmendanî zaroxane debê zanist û hunerî xoyan legel mindalan beş biken, berdewam rêge û şêwazî niwê bidozinewe bo rakêşanî serincî mindal. Sereta karmend û mindal wêkra xerîkî tojînewe û peydozî debin. Bo dozînewey xalî destpêk dekirêt karmendan be hawahengî legel mindalanda xerîkî tojînewe bin û dîsan legel mindalda welam bidozinewe bo ewey mindal lem proseyeda asûde bin. Pêdanî zanistî lebar û guncaw debête binemayîyek bo pirsiyarî niwê û geran be dûway zanyarda.

4. Twanay civakî

Zaroxane debê beha û ferheng bigeynête newey ayende, derfet bidate mindal pere be ferhengî taybetî xoy bidat, zemîne xoş bikat bo geşe û şadîy mindal, bo rahêzanî twanay civakîy hemereng.

Ezimûnî têkelawî mindal û helkirdinyan legel kesanî hawtemenî xoyanda sengî xoy heye bo serxistinî twanay hawkarîy mindal. Lem baseda zaroxane debête rûberêkî berfirewan bo geşey civakî û fêrbûnî hunerî hevaletî. Hemû mindalêk le zaroxaneda, wêray ciyawazî temen, zayend, paşxanî civakî û radey twana, derfetî beşdaryan bo awale dekirêt le çalakîy sûdbexşda.

Twanay civakî dekatewe hunerî pêkewe jiyân, guncan û hawkarî legel kesanî dîke û le doxî corawcorda. Em twanaye katêk geşe dekat mindal derfetî hebêt legel yektir û legel gewreda hawkar û hawaheng bin. Rengdanewey em twanaye hunerî mindale le destpêşxerî û ragirtinî hevaletî. Têgeyîştin le çemik, prose û twanagelî civakî pêwîstî be ezimûn û beşdarîye le civatda. Twanay civakî be kirdewe le rêy beşdarbûnêwe geşe dekat. Emeş le hemû doxekanî rojda rûdedat. Hemû mindalêk debê le buwarî ciyawazda hawkarîy yektir biken û ezimûn wergirin. Rojanî zaroxane debê pir bêt le çêj wergirtin û şadî, wireberzî. Şadimanî nîşaney xoşguzeranîy mindale le zaroxaneda.

Twanay civakîy wek derbirînî hawsozî û hunerî xo danan le cêy beranber le prosey çawdêrî, le geme û le fêrbûnda reng dedenewe. Mindal her le seretay jiyanda hunerî peroşî pêşan deden, xemxorî yektirin, yarmetî yek deden û boçûnî beranber werdegirin. Mindal detwanin xatirî yek bigirin û agaşyan le yektir bêt. Emeş hem be axaftin û hem be kirdewe diyar dedat.

Mindal pêwîstî be hawkarîye bo pere dan be twanay xoy wek takekes û be hawkarî legel kesani dewrûber.

Zaroxane debê yarmetî mindal bikat le jîngeyekî asûdeda geşe bikat, şanaz bêt be reçekî xoy û rêzî ferhengî dîkeş bigirêt. Mindal debê fêr bêt hawsengî nêwan pêwîstyekekanî xoy û kesani dîke rabigirêt.

Twanay civakî zor girînge bo rêgirtin le diyardey civakîy napesendî wek regezperestî û serxistine ser û azardan. Zaroxane berpirse lewey hoşiyarane kar bikar bo rêgirtin le diyardey napesendî civakî.

Bo rahêzanî twanay civakîy pesend, karmendanî zaroxane debê nimûney rêniwên û geş bin.

5. Twanay zimanizanî

Salanî mindalî, binaxey geşe dane be twanay zimanizanîn. Hawjînî û hawkarî, zimanî ceste û geman beşêkî girîngin le ragirtin û pitewkirdinî peywendîy mindal legel dewrûberda. Têgeyiştinî kesani gewresal û selmandinî nîşanekani mindal bekaryan dehênêt, wişe daran beranber kirdar û hest, girîngîy taybetyan heye bo geşekirdinî zimanî axawtin.

Ziman pênasey kesayetîye û xizimî heste. Zimanî zigmak girînge bo geşey kesayetî tak. Fêrbûnî zimanî zigmak be şêweyekî baş pêşmerce bo geşey berdewamî zimanizanî, hunerî nûsîn û xwêdinewe û têgeyiştin.

Zaroxane debê derfetsaz bêt bo hemû mindalêk le buwarî ciyawazda ziman wek amirazêkî peywendî, wek kerestey bîr û derbirînî boçûn û hest bixate kar. Mindal heye geşey zimanizanînî kize, griftî taybetî xoy heye. Emane pêwîstyan be hawkarîy taybet heye.

Beşdarî le çalakîy be komelda derfetêkî taybet derexsênêt bo danûstan le nêwan mindalanda. Helsûkewt û pêkewe karkirdinî mindalan zor girînge bo pey birdin be xulya û wîstî yekdî. Zor car mindal le peywendî nêwan xoyanda xeyalbazî (fantazyay) û şêwazî xoriskî taybet be xoyan dexene kar, ciyawaze le şêwazî peywendyan be cîhanî gewresalanewe.

Zimanî ceste, bekarhênanî amajey leş û cûle geşe dekat berewe bekar hênanî zimanî axawtin. mindal le gemanda zorcar zimanî ciyawaz û aloz bekar dênin.

Mindal heye zimanî dîke becardênin, zimanî kurdî wek zimanî dûwem le zaroxane fêr debin. Zor girînge mindalekan têbigen û derfetî axaftinyan pê bidirêt. Zaroxane debê yarmetî mindal bikat bo bekarhênanî hem zimanî zigmak û hem zimanî kurdî. Karmendan le buwarî zimanda debê nimûne bin. Le axaftin û xwêdineweda be dengî beriz, girîngî be ziman û şêwazî derbirîn biden.

6. Zaroxane wek buwarêkî ferhengî

Erikî zaroxaneyê ferheng û behay civakî bigiwêzêtewe bo newey ayende. Derfet birexsênêt bo afirandinî ferhengî mindal û bo şadbûn. Kar bikat bo serxistinî twanay civakîy mindal.

Mebest le ferheng lêreda huner û edebe, şêwazekani reftare begîştî, zanist, beha, boçûn, ezimûn û şêwazî derbirîne. Ferheng birîtîye le mîrat û dabunerêt, dahênan û zîndûkirdinewe, niwêkirdinewe û

piyadekirdine. Ferheng le kêşmekêşî nêwan dabunerêt û niwêxwazîda geşe destênêt. Debê behay ferhengîy millî û herweha ferhengî cîhanî le planî karî zaroxaneda, be corêkî karîger cêy bikirêtewe.

Mindal le bestên (buwar) y ferhengda beşdar û dahênere, be hawahengî legel mindalî dîke, legel gewresalan û dewrûber ferhengî xoy nojen dekatewe. Mindal lêkdanewey xoy heye bo dewrûberî xoy, mana û nawerok xoy têda debînêtewe.

Mindal debê derfetî hebêt aşnay zimanî ciyawaz û şêwazî derbirînî ciyawaz bêt. Dunyay emro le rêy mêdyawe dunyayekî kiraweye, mindal debê amade bê serinc û boçûnî hemecor û fireziman werbigirêt. Debê twanay hebêt pey bew sîgnalane bibat û şiroveyan bikat.

Kurdistan welatêkî fireferheng û firedîne, dekirê sûd lem dewlemendîye werbigirîn bo serxistinî twanay mindalî Kurdistan û firewandinî hiziryan. Le zaroxaneda debê zemîne saz bêt bo pey birdin be rêzgirtin le ferhengî ciyawazî beranber. Aşnabûnî mindal be ferheng, dîn, ziman û dabunerêtî ciyawaz debête binemayîyek bo derikkirdin û rêzgirtin û pêkewe jîyan.

Karmendan lem buwareda debê nimûneyekî berçaw û geş bin bo rexsandinî zemîney geyandinî behay ferhengî, selmandinî beranber û rêzgirtin le dîdî ciyawaz.

Zaroxane debê beşdarî boney ferhengî nawçey xoy bêt, legel fermange û dezgey hemecorda kobêtewe, seredanî rêkxirawî siyasî, hkûmetî û medenî bikat. Pirdî nêwan newey emro û pêşû pitew bikat. Karmendan debê le rêgey kitêb, edeb, goranî, mosîqa û dahênanî taybetewe dabunerêtî kon bigiwêzinewe bo mindalan û biyankene mayey mîlletdostî.

Beşî sêhem

Buwarî wane

Zaroxane debê zanyarîy hawçerx derbarey babetî hemecor bidate mindal. Erikî zaroxaneyê yarmetî kuçkawî, dahênan, peydozî û tojînewe bidat.

Her waneyek beşêkî berînî fêrkarî degirête xo. Wane be degmen nebêt tenya nayete berbas. Zor car çendîn babet wêkra û hawkat dexirêne ber bas. Le têkelawî civakî, geman û çalakî rojaneda zor car peywestibûnî babetekan dekewête rû. Mercî game û têkelbûnî mindal peyweste be çêj wergirtin û beşdarbûnyan le çalakîy hawbeşda.

Her waneyek mebestêkî diyarîkirawî darêjrawî heye bo karkirdin, geşey fêrbûnî mindal û rûnkirdinewey erikî karmendan. Astî wane legel helkişanî temenda ser dekewêt. Arezûy mindal û mercî dewrûber behend werdegîrên. Têkstî wane, şêwazî kar, kereste û rêkxistin be pêy twanay mindal dête guncandin. Debê agaman le twanay mindal bêt û rêgey bideyn be aramî hengaw binêt. Mindal heye pêwîstî be hawkarîy taybete, heye tîjrewê.

Zaroxane azade le dariştinî planî karî xoyda, le çonîyetîy dariştinî wanekan û şêwazî guncandinyan legel twanay mindalda. Girîng amance, ewîş geşe û pêşkewtine.

1. Danûstan, ziman û têkst

Zemînesazîyekî baş û zûy zimanizanî pêşmercêkî girînge le planî karî zaroxaneda. Hunerî danûstan birîtîye le nardin û wergirtinî peyame, têgeyîştin û welam danewey beranber. Herdû corî peywendî çî zimanî bê û çî bêzimanî girînge bo geşepêdanî danûstan. Aşnabûn be zanyarî û ezimûnî ciyawaz girînge bo têgeyîştin le têrim û zarawey ciyawaz. Giftûgo derbarey diyarde, boçûn û hest pêwîstî bo geşepêdan û dewlemendkirdinî ziman. Têkst birîtîye le herdû layenî gutin / deng û nûsîn. Honrawe, pexşan, wişewazî û goranî le buwarî danûstanda hunerin.

Ziman û têkst le buwarî danûstanda girîngin, mindal debê:

- Le danûstanî dû layeneda giwê bigirêt, serinc bigirêt û welam bidatewe
- Berdewam geşe bidat be twanay derbirînî wişe û zarawey puxt
- Twanay hebêt hest û dawakarîy xoy, le buwarî hemecorda, be ziman derbibirêt
- Twanay hebêt ziman bikate amirazêkî dahênan bo axaftin derbarey têkst û berhemî hunerî
- Serinc bidate deng û rîtimî ziman, nasînî hêma, jimare û pît
- Aşnay berhemî nûsiraw, bîstiraw û bîniraw bêt

Bo karkirdin be arastey amancekan pêwîste karmendan:

- Nimûne bin le şêwazî giwêgirtin, welam danewey lebarw bekarhênanî zimanî ceste
- Mitmaney nêwan xoyan û mindal pitew biken. Weha bêt mindalan hest be şadî û asûdeyî biken le danûstan û bekarhênanî ziman û têkstî corawcor le jiyanî rojaneyanda.
- Kar biken bo rexsandinî zemîney baş, kat û şiwên û babet, bo bekar birdinî zimanî axawtin û zimanî ceste le çalakî rojaneda

- Kar biken bo rexsandinî jîngeyekî handerî ziman bo hemû mindalan: hanyan bidat bo giwêgirtin, giftûgo û gemey be deng, rîtim, awaz û goranî.
- Seng û girîngîy zimanî zigmak derik biken
- Handanî ew mindalaney dû ziman yan pitiryan heye bo ewey ziyatir çalak bin le buwarî zimanda û le heman katda yarmetyan biden bo fêrbûn û têgeyîştin le zimanî kurdî
- Kar biken bo rahêzanî twanay ew mindalaney kêşey ciyawazyan legel danûstan heye
- Karêk biken jimare û pît rojane leber çawî mindal bêt,
- Sîstemî padaşt (destxoşî) bixate xizmetî mindalî destpêşxerewe
- Jîngeyekî rojaney şad û pir coş bo mindalan ferahem bikat, têyda xwêndinewe be dengî beriz, çîrok gêranewe, goranî û axaftin derfetyan gerim bêt.

2. Leş, cûle û saxlemî

Le mawey temenî biçûkîda mindal fêrî twanay cûle seretayîyekan, bekarhênanî leş, twanay fîzîkî, rahatin û parastinî saxlemî debîn. Mindal le bekar hênanî leşda çalakin, şêwey derbirînyan be zorî le cûley leşewe serçawe degirêt. Le rêgey çalakî leşewe mindal aşnay xoy û cîhanî dewrûber debêt. Le rêgey hest û cûlewe mindal şarezayî, zanyarî û twana le zor buwarda peyda dekat.

Peywendî mindal legel mindalî dîke bezorî le rêgey çalakî û amajey leşewe. Emeş karîgerî heye bo geşepêdanî radey twanay civakî. Xwardinî baş û goran le nêwan çalakî û pişûda karîgere bo binyadnanî leşêkî saxlem. Çalakî fîzîkî corawcor le naw û derewey zaroxaneda bayexî heye bo geşey dirustibûnî twanayîyêkî helsurêner û leşêkî sax. Bekarhênanî siruşt û jîngey dewrûber derfetî pitir dedate mirov.

Le rêgey cûle û bekarhênanî leşewe, zaroxane kar dekat bo ewey mindal:

- Pey berêt be sûdî cûle û bekarhênanî leş
- Şarezayî û ezimûnî baş werbigirêt le cûley ciyawaz û hemelayene
- Berdewam twanay leşî xoy pêş bixat, xerîkî rahênanî cûley req û cûley nerim, rîtim, hest û balansî bizwêner bêt
- Ezimûn wergirtin le jîyanî naw siruşt û werze ciyawazekanî sal.
- Fêrî peydozî, cûle û çalakîy nêw siruşt bêt
- Fêr bêt sûd le siruşt werbigirêt
- Fêr bêt siruşt biparêzêt
- Pey berêt bewey twanay leş le kesêkewe bo kesêkî dîke ciyawaze û debê rêz lew ciyawazîye bigîrêt
- Zanyarîy hebêt derbarey sûdî xorak bo leş

Bo geşîştin bem amancane debê karmendan:

- Le bernamey rojaneda katî pişû, çalakî û jemî xwardin diyarî biken
- Zanyarî bidene mindal derbarey xorak û xawênî, çalakî û pişûdanî baş
- Bernamerêjî biken bo sûd wergirtin le jîngey dewrûber û herweha werzekanî sal
- Sûd werbigirin le fireferhengî nêw zaroxane betaybetî ewey peyweste be leş û werzişewe.
- Zemînesazî bo çalakî û beşdarî hemwan: be paşxanî ferhengî û dînîy ciyawaz, zayend û doxî abûrîy ciyawaz.
- Derfet xoş biken bo çalakîy be girup.
- Derfet xoş biken bo despêşxerîy mindal

- Zêrfet xoş biken bo hawkarî nêwan kiç û kur
- Zanyarî biden derbarey firyakewtinî seretayî.

3. Huner, ferheng û dahênan

Zaroxane debê derfet bidate mindal çêj wergirêt le ferheng û huner. Hawkarîy ferhengî û dahênanî girupkarî, hestî hogirî û hevaletî pitew dekat. Mindal çêj le ezimûnî hunerî xoy werdegirêt û lêy debêt be ferheng. Le rêgey dewlemendkirdinî ezimûnî hunerî, ferhengî û ciwankariyewe mindal astî bîrkirdinewey, danûstan, ciwannasî û afirandinî firewantir debêt. Babetî hunerî birîtîye le şêwazî derbirîn le wêne, hunerî karî destî, muzîk, sema, dirama, ziman, edeb, fîlim, nexşesazî û hêlkarî û htd. Ferhengkarî dunyay mindal zengîntir dekat.

Zaroxane, le rêy hunerkarî û ferhengkarîyewe, têdekoşêt mindal geşe bidat be:

- Hestî giwêgirtin, serincgirtin û derbirîn
- Twanay derbirîn le kesayetî û peyamî xoy be şêwî hunerî hemecor
- Xeyalbazî (fantazyay), bîrkirdineweyekî dahênaneraney şadîhên
- Zanyarîy seretayî derbarî kerestey kar pêkirdin, teknîk û şêwaz
- Twanay ziman, mozîk, goranî, sema û dirama
- Twanay ciwannasî û hunerdostîy xoy

Bo geyîştin bem amancane debê karmendan:

- Jîngeyekî hunerî û ferhengî lebar bo gewre û bo mindal birexsênin
- Pey berin be peywendîy nêwan ferheng, huner û gemey mindal
- Huner bikene diyardeyekî rojane: kitêb, wêne, muzîk hemîşe berdest bêt
- Giwê bigirin le mindal û serinc bidene boçûne ferhengîyekanî
- Rêz le şêwazî derbirînî mindal bigirin û hanî biden geşe bew twanaye bidat
- Mindal han biden bo tojînewey ferhengî
- Mindal han biden bo serincgirtin le ciwanîy siruşt,
- Mindal han biden bo serincgirtin le wirdekarîy berhemî hunerîy hemereng
- Mindal han biden bo fêrbûn û taqîkirdinewey hunerî hemecor be kirdewe
- Mindal han biden zanyarîy giştî peyda bikat derbarey hunerî hemecor
- Mindal han biden aşnay ferhengî nawçeyî, mîllî û cîhanî bêt û çêjiyan lêy werbigirêt

4. Siruşt, jînge, teknîk

Siruşt serçaweyekî berfirewane bo çêj wergirtin, meydanêkî berîne bo çalakîy hemecor le her çîwar werzî salda. Siruşt serçaweyeke bo hestî ciwan û handerêke bo derbirînî ciwan. Wanekanî zaroxane debê mindal aşna biken be siruşt û girîngîy parastinî siruşt: zewî, hewa û aw, rûwek û giyaneweran, werzekanî sal û keş û herweha samanî mîllî. Yekêk lem amancane têgeyîştinî mindale le girîngî û geşey berdewamî siruşt û parastinîyetî bo newey dahatû. Emeş pêwîstî be xoşwîstinî siruşt û be derikkirdinî peywendî nêwanî mirov û siruşt dête dî.

Debê zaroxane le rêgey karkirdin legel siruşt, jînge û teknîk yarmetî mindal bidat bo:

- Peydakirdinî zanyarî derbarey siruşt, be serdan û geran û serinc dan

- Derikkirdinî girîngîy siruşt be fêrkirdin û bîrkirdinewe
- Rêzgirtin le siruşt û parastinî
- Pey birdin be peywendî nêwan pêkhatekanî siruşt: mirov, xak, riwek, giyaneweran, aw. Hewa û htd.
- Çêj wergirtin le siruşt belam be wiryayîyewe
- Bekarhênanî teknîk be şêwazêkî siruştparêz û jîngedost

Bo geyştin bem amancane debê karmendan:

- Mindal han biden bepêy twana, kunçkawî û xulyay xoyan serinc bigirin le siruşt û bekar hênanî teknîk le siruşt
- Hewil biden mindal pey berin be girîngîy geşe û berdewamî û manewey siruşt
- Çalakîy nêw siruşt bikene bernamey rojane
- Mindal han biden serinc bidate jîngey dewrûber: giyanewer û riwek
- Mindal han biden serinc bidate keş
- Mindal han biden serinc bidate diyardey siruştî wek rojhelat û rojawa, lafaw, bahoz, bûmelerze ...htd
- Mindal têbigênin le çonîyetî weberhênanî xorak
- Pêdanî zanyarî derbarey zan (ledayikbûn), geşe, pîrbûn û mirdin.
- Hewildan bo geşe û ziyadkirdinî şarezayî mindal derbarey game û teknîk

5. Akar, dîn û felsefe

Akar, dîn û felsefe karîgerî heye leser şêwazî bîrkirdinewe û cîhanbînîy mindal. Felsefe û dîn beşêkî girîngin le ferhengî mirovayeti û darêjerî şarêy norm û akarin. Serçaweyekin bo diyarîkirdinî behay bineretî û şêwazî helsûkewtî nêw civat. Civatî Kurdistan emro niştîmanî dîn û ferhengî ciyawaze. Zaroxane debê rêz le firedînîy nêw girupî mindalan bigirêt, berêzewe helsûkewt legel wirdekarîy ferhengîyan bikirêt. Wêray ew firerengîye debê kar leser behay hawko û dîdî mirovdostaney niştîmanparêz bigrêt.

Zaroxane le rêy akar, dîn û felsefewe debê hewil bidat mindal:

- Şarezay beha û normî bineretîy civakî bin: rêzgirtin, rastgoyî, destpakî, hawkarî w... Htd
- Geşe biden be twanay civakî: singfirewanî, xoragirî, hawsozî w... Htd
- Rêzgirtin le dîn, ziman û ferhengî ciyawaz
- Aşnabûn be cêgey dînîy nawdarî Kurdistan û cîhan
- Aşnabûn be dabunerêtî dînîy ciyawaz
- Aşnabûn be cîhanbînî û dîdî ciyawaz

Bo karkirdin be arastey ew amancane debê karmendan:

- Xoyan be berpîrs bizanin le piyadekirdinî behay bineretîy zaroxane
- Birwa, pîrsiyar û ramanî mindal behend werbigirin
- Zemîne saz biken bo raman, bîrkirdinewe û giftûgo derbarey behay giştî
- Derfet saz biken bo aşnabûn be derikî yektir, selmandinî yektir
- Yarmetîy mindal biden katêk gîrodey kêşeyek debin
- Nimûne bin le rêzgirtinî dîn û ferhengî kesianî beranber

6. Jîngey dewrûber û civat

Beşdarîy mindal le jîyanî nêw zaroxane hengawêkî seretayîye bo peydakirdinî şarezayî û beşdarîkirdin le civatêkî dêmokratda. Zaroxane debê mindal wa rabênêt le derewey malewe be mitmane û kunçkawîyewe legel xelkî nenas helsûkewt bikat.

Zaroxane debê serçaweyek bêt bo zanyarî derbarey civat û bazar, siruşt û ferheng. Mindal debê beşdar bêt le tojînewe û peydozîy jîngey xoy. Ezimûne ciyawazekanî mindal le mal, peywendîy legel dostan û herweha geştî dewrûber zanyarî derbarey diyardey ciyawaz dedat be mindal.

Le rêgey karkirdin leser nawçe û civat debê zaroxane hewil bidat mindal

- Mitmaney hebêt be beşdarî û karîgerîy xoy le civatda
- Zanyarîy giştî peyda bikat
- Şarezay jîngey xoy bêt
- Şarezay civatî xoy bêt
- Be rêz û dîdêkî yeksan peywendî kiç û kur ragirêt
- Aşnay datakarî bêt
- Agadarî dengûbasî rojane bêt
- Agadarî rûdawî cîhanî bêt
- Aşnay dîn û netewey ciyawazî Kurdistan bêt
- Aşnay dastan, çîrok û şaberhemî edebîy mindalaney cîhan bêt
- Aşnay goranî û hunerî mindalaney cîhan bêt

Bo karkirdin be arastey ew amancane debê karmendan

- Behay mirovdostaney dêmokratî reçaw bigirin
- Bayex biden be mindal û pêgey mindal le karî rojaneda
- Derfet biden be mindal ra û serincî xoy derbibirêt derbarey karûbarî hemecor
- Pêşanî biden ke gutar û reftarî mindal seng û karîgerî heye leser xoy û leser dewrûber
- Zanyarî seretayî biden be mindal derbarey girîngî mafî mirov û mafî mindal
- Be gutar û be kirdewe cexit leser beraberîy kiç û kur biken
- Kar leser singfirewanî û selmandinî yektir, dîn û ferhengî yektir biken
- Rê bigirin le hemû diyardeyekî nêzik be serxistineser
- Rê bigirin le hemû diyardeyekî nêzik be regezperestî
- Mindal fêrî hawsozî û hawkarî biken bo nimûne le rêy edeb û hunerewe
- Mindal fêrî welatparêzî û mîlletdostî biken le rêy geşt û seredanî hemecor
- Mindal han biden be dîdêkî rexnegirane helsûkewt legel mêdya biken.

7. Jimare, şêwe û endaze

Mindal le temenêkî zûda arezûy jimare û jimardinyan le la dirust debê. Forim û endaze serincyan radekêşê. Dekewine wirdbûnewe û bîrkirdewe û geran be dûway peyweste û peywendîy nêwan babet û diyardey ciyawaz. Mindal le rêy geme, taqîkirdinewe û çalakî rojanewe twanay matimatîkî xoy geşe pêdedat. Zaroxane berpirse le handanî mindal berew tojînewe û peydozî lem buwareda.

Le rêgey karkirdin be jimare, şêwe û endaze debê zaroxane yarmetîder bêt bo ewey mindal

- Hest be şadî bikat le twêjînewe û geme be jimare û şêwe / forim
- Peyweste û hawkêşey asan û lebar bidozêtewe
- Fêrî rêkxistin û guncandinî jimare û forimî ciyawaz bêt
- Şarezabûn, le lêkolînewe û geme be qebare û şêwe/forim
- Fêrî pêwan û kêşan bêt
- Fêrî berawird û polên bêt

Bo karkirdin be arastey ew amancane debê karmendan:

- Serenc bidene layenî matimatîkî le axaftin û gemey mindalda
- Yarmetî geşey matimatîkaney mindal biden bepêy arezû û şêwazî derbirînî matimatîkaney xoy
- Jimare, şêwe û endaze bikene beşêk le gemey rojane
- Kunçkawî û twanay matimatîkaney mindal han biden
- Serincgirtin û raman legel mindal derbarey wêkiçûn, wêkneçûn, endaze, jimare û handanî mindal bo bekar hênanî ziman wek amirazêkî lojîkaney bîrkirdinewe.
- Lîstok (kerestey geman) y hemereng û hemecor û şêwaz bo mindal dabîn biken bo rahênanyan be rêkxistin, polên û berawirdkirdin
- Derfet birexsênin bo mindal şarezay dîzaynî corawcor bêt
- Le rêy gemanewe mindal aşnay pêwane û kêşane, jimardin û mezendekarî biken.

Beşî çiwarem

Plan danan û harîkarî

Plan danan, dokîwmêntbendî û hêlengandin

Zaroxane melbendêkî fêrkar û perwerdekare, pêwîstî be plan danan, dokîwmêntbendî û hêlengandine. Hemû zaroxaneyek serbeste le helbijardin û bekarhênanî şêwazî berêwebirdin û kargêrî be mercêk letek pêdawîstî û jîngey xoyda biguncêt.

Dariştinî planî kar debê nerim û bergorîn (amadey gorîn) bê bo ewey her kat pêwîst bû, legel xwast û pêwîstî mindalekan û mebestî beşdarbûnyan biguncêndirêt. Berêweberî zaroxane berpirse le dariştin û piyadekirdinî planî kar, dokîwmêntbendî û hêlengandin. Berêwberî perwerdekar (mebest le berêwberî perwerdekarî pêdagoge, le her beşêk pêdagogêk berpirse le dariştin û hêlengandinî bernamekan) berpirse le dariştinî bername, dokîwmêntbendî û hêlengandinî ew girupaney lêyan berpirse.

Berêweberî zaroxane û berêwberî perwerdekar (pêdagog) berpirsin le:

- Diyarîkirdinî amancî zaroxane
- Dariştinî planî kar
- Kokirdinewey karmendanî zaroxane be arastey amanc û bepêy planî kar
- Pêkhênanî dîdêkî hawko derbarey behay bineretîy zaroxane
- Beşdarîy xêzan le karûbarî zaroxaneda û agadarkirdineweyan le hemû wirdekarîyekî pêwîst
- Beşdarîy mindal le serukarî zaroxaneda

1. Plan danan

Planî baş û guncaw debête hoy dirust bekarhênanî hêzî mirov, kerestey zaroxane û herweha jîngey dewrûber. Şaamancî zaroxane - ke le qanûnî zaroxaneda cexitî Leser dekirêt – birîtîye le dariştinî planî kar, rêkxistinî karmendan û diyarîkirdinî prosey kar.

Planî karî salaney zaroxane serçawe lem xalanewe degirêt:

- Zanyarî derbarey geşe û twanay mindal
- Çawdêrî,
- Dokîwmêntbendî,
- Mercî bergoran (amadey goran)
- Sîstemêkî hêlengandinî berdewam
- Giftûgoy berdewam legel mindal û xêzan

Hemû zaroxaneyek debê planî karî salaney hebêt. Zaroxane bo xoy biryardere le dananî planî karî kurtitir û şêwazî coraucor le sêberî planî karî salaneda. Herweha deşêt zaroxane pêwîstî be planî dirêjxayenîş hebêt bo destberkirdinî pêşkewtin û berawirdkirdinî fêrbûn û beserhatî mindal le hemû mawey manewey le zaroxaneda.

Geşey twana û rêkxistinî karmendan debê bernamey dûrî hebêt. Planî salaney zaroxane debê peywendîyekî rastewxoy be planî şarewanî / beşî zaroxane û şiwênî jîyan û jîngey mindalewe hebêt.

Planî salane çendîn karîgerîy heye:

- Amadkirdinî kereste û amirazî pêwîst bo karmendanî zaroxane bo berêwebirdinî karî xoyan be arasteyekî gunçaw
- Derfet dan be xêzan karîger bin Leser nawerokî plan û karî zaroxane
- Desteberkirdinî deselatî çawdêrîy şarewanî beser zaroxaneda
- Dabînkirdinî zanyarî pêwîst derbarey rewî karî zaroxane bo kesanî peywendîdar.

Nawerokî planî karî sal debê zanyarî pêwîst derbarey çawdêrî, perwerde, geme û fêrkarî le xo bigirêt bo desteberkirdinî geşe û çalakîy dirust. Hawkarî û hawrayî xêzanî mindal lêreda zor girînge. Planî sal debê zanyarî bidat derbarey:

- Çonîyetîy cêbecêkirdinî qanûn û rêsay zaroxane,
- Çonîyetîy piyadekirdinî nawerokî plan
- Dokîwmêntbendî
- Helsengandin
- Yadkirdinewey rojanî mêjûkirdî mîllî û cîhanî
- Planî giwastinewey mindal le zaroxanewe bo fêrge
- Çonîyetîy rexsandinî derfet bo beşdarîy mindal le karûbarî zaroxaneda

Derbarey dariştinî planî karî salane

- Le layen encumenî hawkarîyewe diyarî dekirêt
- Rêge dedirê mindal beşdar bêt le dariştinî planda, rastewxo giftogoyan legel dekirêt derbarey guncandinî plan legel xwast û xulyay ewanda
- Debê derfet bidirête xêzan bo beşdarîy çalakane le dariştinî nawerokî planî karî zaroxane
- Pirsî taybet derbarey nawerok û bayex dan be pêdawîstîy mindal debê le layen destey rawêjkarî xêzan û encûmenî hawkarîyewe tawtwê bikirêt.
- Zor girînge pêştir pirsura be xêzan bikirêt derbarey xwast û çonîyetîy şêwazî beşdarîyan le dananî planî karî sal.
- Berêweberî zaroxane berpirse le dariştinî nawerokî perwedekaraney planî karî sal.

2. Dokîwmêntbendî û tomarî zaroxane

Zanyarî derbarey karî karmendan û çonîyetî doxî mindal binemay zor girîngin bo geşey zaroxane. Dekirêt tomar (belgey nûsiraw - dokîwmênt) amirazêk bêt bo dozînewey serincî ciyawaz û derwazeyek bêt bo rexne û pêşxistinî kar.

Tomarî zaroxane serçaweyekî zanyarîye bo xêzan û berpirsanî karûbarî zaroxane. Tomarî zaroxane debê rengdanewey karî rojaney zaroxane bêt. Le belgekanda derdekewêt ta çi radeyek riwangey akar reçaw gîrawe le geman û çalakîy zaroxaneda.

Ger zorbey rûdawî rojaney zaroxane tomar bikirên, gutar û reftarî mindal û karmendan bikirêne belgey nûsiraw, ewsa em tomare debête serçaweyekî girîng deşê xêzan sûdî lê werbigirêt bo serinc dan derbarey rewî kar. Em tomare debête kerestey çawdêrî û helsengandin.

Deşê tomarî zaroxane - be agadarîy, hawrayî û selmandinî xêzan û serperîştyaranî mindal – bo pêşxistinî barûdoxî mindal bixirête berdest dezgey yarîderî taybetkar. Eger amancêkî taybetî bo mindalêk diyarî kira, debê hokarî hebêt û amancekan be hawkarî û hawahengî xêzan û layene peywendîdarekanî derewey zaroxane dabînrêt.

Em core tomare deçête jêr qanûnî parastinî zanyarî û be hestyar û nihênî dejimêrdîrên. Dekirêt faylî taybet be plan danan û çawdêrîkirdin le jêr mafî xawendaryetî bêt (mafêke taybet be xawenî zanyaryeke ke deselat/ dezgey çawdêrî zanyarî bepêy qanûn be xawenekey dawey). Bepêy qanûnî parastinî zanyarî, debê dezgey çawdêrîy zanyarî molet bidat bo bekarhênanî zanyarîy hestyar. Xêzan mafî heye tomarî mindalî xoy bixwênêtewe.

3. Helsingandinî karî zaroxane

Nawrok, şêwaz û corî karî rojane le zaroxaneda karîgerîy zore leser geşey mindal. Şadî û geşey mindalan be tak û be girup debê berdewam le jêr çawdêrî û helsingandinda bêt. Helkirdin û hawkarîy nêwan mindalan û herweha peywendîyan legel karmendanda debê rojane cêy serinc û têbînî bêt. Karî rojane beranber qanûn, rêsa û herweha planî karî zaroxane debê berdewam le şirove, berawird û helsingandinda bêt.

Derbarey helsingandin

- Berêweberî zaroxane berpîrsî yekeme le helsingandinî berdewam û sîstembend, awale û bernamedar.
- Berêweber debê helsingandin be agadarî û hawrayî hem xêzan û hem karmendanî zaroxane cêbecê bikat.
- Destey rawêjkarî xêzan û encûmenî helbijêrdîrawî hawkarî, debê deselatî rastîneyan hebêt planî karî zaroxane be pêy encamî helsingandinekan pêş bixen.
- Cor û şêwazî helsingandinî karî zaroxane, nawerok û amanc, mêtud û pêweryan le planî karî salaneda rûn dekirênewe.
- Ezimûn û serincî mindal le prosey helsingandinda sengiyar heye
- Tomarî zaroxane, belgenome û helsingandin zanyarîy hestyarin û debê be wiryayîyewe karyan legel bikirêt. Qanûn û rêsa heye bo parastinî zanyarî hestyar û debê reçaw bigîrên. Hiç zanyarîyekî taybet be taketake mindal naçête derê.
- Tomar û belgenome û helsingandin bo giftûgo û rawêje legel girupî karmendan û legel xêzan.
- Debê encamî helsingandinekan bikirête binemayek bo karkirdin le ser planî karî salî dahatû.
- Dekirê kesanî dîkey peywendîdar agadarbin le encame giştîyekanî helsingandin be mebestî giftûgoy firewan û pêşxistinî karî zaroxane.
- Bekar hênanî helsingandin bo nojenkirdinewey balexaney zaroxane bepêy planî darêjraw, be reçawgirtinî pêwîstîy konkîrêtî mindal û girupî xêzan.

Karî helsingandinî bernamedar zaroxane dekate sazimanêkî fêrkarî. Zaroxane dezgeyekî xawen ferheng û dabunerîte, twanay hemereng û zanyarî firerhendî heye. Giringe em xesletane behend bigîrên, karyan leser bikirêt, pêşan bidîrên û bibine binemay karî firajûtinî ayende.

Beşî pêncem

Harîkarî

Dabînkirdinî xizmetguzarîy rêk û puxte bo xêzanî mindaldar erikî şarewanîye. Leber ewe debê zaroxane baştirîn hawkarî û hawahengîy hebêt legel dezgey şarewanîda be mebestî pêşkeşkirdinî baştirîn xizmet be mindal. Pêşxistinî buwarî perwerde û fêrkarî debê herdem serşarî karî zaroxane bêt. Lêreşda hem xêzan û hem zaroxane pêwîstyan be hawkarîy dezgey yarîderî hkûmetî debêt. Le hawkarîda debê hemû zanyarîyek bepêy qanûnî parastinî zanyarî û nihênî helsûkewtî legel bikirêt.

1. Xwêndinî bineretî

Zaroxane debê, be hawkarîy fêrge, amadekarî bikat bo giwastinewey mindal le zaroxanewe bo polî yekem. Em kare be hawkarî û hawayî tewawî xêzanî mindal berêwe deçêt. Şêwazî giwastinewey mindal le zaroxanewe bo fêrge debê le planî karî salaneda diyarî kirabêt.

Zaroxane û fêrge herdûkiyan dezgen bo dabînkirdinî çawdêrî, fêrkarî, perwerde, derfetî game û geşekirdin. Mindal le rewî fêrkarîy em nêwendaneda rûberûy hem wêkiçûn debê û hem ciyawazî. Zaroxane û fêrge le seryane zanyarî pêwîst derbarey karî xoyan alugor biken. Zaroxane û fêrge berpirsin lewey mindal zemîney hebêt be aramî û asûdegîyewe le zaroxanewe berew fêrge helkişêt. Be şadîyewe malawayî le zaroxane bikat û dîsan be şadîyewe rû le fêrge bikat.

Hawkarîy nêwan zaroxane û fêrge

- Zaroxane ber lewey zanyarî derbarey mindal bidate fêrge debê pirs be xêzanî ew mindale bikat
- Xêzan debê agadarî nawerok û çonîyetîy gorînewey zanyarîyekan bêt.
- Gorînewey zanyarî û hawkarîy nêwan zaroxane û fêrge debê be mebestî rahêzanî twana û karameyî mindal bêt. Bo pitewkirdinî layenî lawaz û geşekirdin bêt.
- Mindal heye xawen pêdawîstîy taybete, hawkarîy pêşkatî nêwan zaroxane û fêrge bo dabînkirdinî pêdawîstî û rexsandinî zemîney lebar lem baseda zor girînge.
- Mindal le zaroxaneda detwanêt daway cêge le çendîn fêrge bikat.
- Şarewanîy debê rêgeyekî guncaw û konkirêt bo şêwazî hawkarîy nêwan fêrge û zaroxane bidozêtewe.

2. Xizmetguzarîy dezgey çawdêrîy mindal

Şarkî dezgey çawdêrîy mindal dabînkirdinî jîngeyekî asûde û arame bo ew mindaley pêwîstî pêye. Heye barûdoxî jiyani aloze, heye barî saxlemîy narêke. Bo ewey dezgey çawdêrîy mindal bitwanêt erikî xoy becê bigeênêt berdewam pêwîstî be zanyarîye le dezge û kesani dîkewe. Karmendanî zaroxane rojane le peywendîdan legel mindalda û şarezay barodoxî jiyanyan hen. Zor girînge karmendanî zaroxane, zanyarî pêwîst bidene dezgey çawdêrîy mindal derbarey ew mindalaney barûdoxî jiyanyan nahemware bo ewey be baştirîn şêwe û be zûtirîn kat hawkarî bikirên.

Hemû karmendêkî zaroxane ger hest bikat mindal heye jiyanî nalebare û be şêweyekî nadirust reftarî legel dekirêt, bepêy qanûn berpirse le geyandinî zanyarî be dezgey çawdêrîy mindal û nabêt reçawgirtinî qanûnî paristinî nihênî bikate lempêr û kosp lem kareda.

Dabînkirdinî cêge bo mindal le zaroxaneda yekêke le xizmetguzarîyekanî dezgey çawdêrîy mindal. Em kare be rêkewtinî nêwan herdû la dête biryardan.

Zor girînge zaroxane û dezgey çawdêrîy mindal be şêweyekî baş hawkarîy yektir biken hem bo dabînkirdinî cêge bo mindal û hem bo gorînewey zanyarî derbarey doxî mindalêkî taybet. Debê hawkarîy nêwan her dû la berdewam û bernamedar bêt. Eriki şarewanîye rêgey pêwîst bigirne ber bo dananî xiştêy harîkarîyekî gunçaw le nêwan zaroxane û dezgey çawdêrîy mindalda.

Amancî hemû dezgeyekî peywendîdar be mindalewe xizmetkirdinî mindale, dabînkirdinî pêdawîstîy girîngî geşeyetî. Lem amanceşda debê hemû layek hawkar û hawaheng bin.

3. Binkey saxlemî

Binkey saxlemî le şarewanîda begîştî berpirse le berêwebirdin û dabînkirdinî pirsî saxlemî û geşeyekî aram bo mindal. Binkey saxlemî detwanêt dawakarî binêrêt bo dabînkirdinî cêge le zaroxane bo mindalêk ke pêwîstî be çawdêrîy taybet heye û herweha pêşniyaz û amojgarî bidat be layenî peywendîdar bo pêşxistinî mindal le rîzî çawerwanîy zaroxaneda.

Binkey saxlemî dekirêt hawkarêk bêt bo guncandinî buwarî çawdêrîy mindalî xawen pêdawîstîy taybet. Binkey saxlemî amojgarî û rênimayî derbarey bekarhênanî derman û şêwazî xo parastin le tûşbûnî nexoşî dedate zaroxane. Leweş bitirazêt binkey saxlemî kar Leser geşey twanay zimanizanîy mindal dekat.

4. Xizmetguzarîy fêrkarîy – derûnnasî

Xizmetguzarîy fêrkarîy – derûnnasî berpirse le mindalanî jêr temenî xwêndin. Be pêy qanûn berpirsin le dabînkirdinî hawkarîy fêrkarîy û derûnnasî le zaroxaneda bo her mindalêkî pêwîstî pêy hebêt.

Xizmetguzarîy perwerdeyî- derûnnasî yekêke lew dezge şarezayaney paş helsengandin detwanêt biryar bidat derbarey çonîyetîy hawkarîy mindalêk griftî cesteyî û mêşikiyan hebêt. Herweha detwanêt amojgarî û rêniwênîy derbarey perwerdey taybet û yarmetîy taybet bidate zaroxane.

Hemû hawkarîyekî nêwan zaroxane û dezgey dîke debê be agadarî û rezamendîy xêzanî mindaleke bêt. Debê xêzan be şêweyekî çalak lew proseveda beşdarbin.

5. Dezgey fêrkarî

Bepêy qanûnî fêrkarî, xawenî zaroxane erike leseryan rêge biden be fêrxwazanî kolêjî mamostayan piraktîk û beşî rahênanî xwêndinî xoyan le zaroxaneda encam biden. Berêwberî zaroxane û pisporanî fêrkarîy zaroxane erike leseryan hawkarî û rêniwênî fêrxwazanî tazedêrçû biken.

Zaroxane debê hawkarîy ew fêrxwazaneş bikat ke fêrgey amadeyî pîşenasî deyaninêrêt bo piraktîk û ezimûn peydakirdin. Mawey piraktîkî fêrxwazan debê le planî karî salda cêy hebêt. Zaroxane detwanêt hawkarîy zanko û fêrgey dîke bikat le buwarekanî geşepêdanî kar û karameyîda.

6. Hawkarîy dîke

Dekirêt zaroxane hawkarî legel saziman û fermangey dîkey civatî xoy bikat. Hawkarî û hawahengî le buwarî ciyawazda be mebestî serxistinî rahêzanî twanay mindal, firewandinî hizir û hoşiyarîyan derbarey civat û jînge, sûdî giştî têdaye û debê rêy bo xoş bikirêt.

«...»